

"Baskê dijî yekrêziyê di kiryarên xwe de berdewam e"

Kurdistan Cîhad Xidir



Emîndariya Giştî ya Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, çekdarên bi ser PYDê ve çalakvanê ragihandinê Fener Mehmûd girtin e û

ber bi cihekî nediyar ve birin e. ENKSê di daxuyaniya xwe de diyar jî kir, ev girtin piştî helmetek a girtin û revandina hejmarek xwendevan û malbatên wan li Dirbêsiyê hat. ENKSê diyar kir,

girtina çalakvan Fener Mehmûd tekeziyê li wê yekê dike, ku Rêvebirî û kesên birêve dibin, nikarin rêzê li nerîn û îradeya xelkê bigrin û zimanê gef û hêzê li dijî wan bikar tînin in. Emîndariya

Giştî ya ENKSê got, ev kiryar wê yekê diyar dike, ku PYDê rêgiriyan li pêşya her lihevtêgehiştinek Kurdî datînin e û danûstandinan dike armanc. Daxwaza azadkirina hemû girtiyan

dike û daxwaz ji serkirdayetiya HSDê jî dike, sînorekî ji van kiryanan re deyne û bi berpirsariya xwe rabe. Mihemed Elî li ser vê mijarê dibêje ew baskê li dijî yekrêziya Kurd-Kurdî ye di kiryarên

xwe de berdewam e û naxwaze ev yekrêzî biçe serî ji berk u ew alî sûdmend e. Sûzan jî dibêje, nabe ev kiryar ENKSê jî yekrêziyê sar bike heta ku hincet di destê aliyê din de nemîne.

Karê Komîteya Destûrê Sûriyê tê astengkirin

Kurdistan-
Mehmûd Omer

Gera pêncem ya civînên Komîteya Destûrê Sûriyê li Cinêvê bê encamp bidawî hatin. Şanderê Navdewletî ji bo Sûriyê Geir Pedersen di kongirekî rojnamevanî de ragehand ev ger ne li gor hêviyan bû, û ti encam jî jê derneketiye, û alî negihiştine rêkeftinê û ti demek ji bo gera bê jî nehatiye destnîşankirin. Pedersen got wî ji 45 endamên Komîteya Destûr re gotiye kar bi vî şeweyî berdewam nabe û dazanîn ku ewê dê tevahiya hûrgiliyên ve gerê di vivîna civata Ewlekariya Navdewletî de pêşkêş bike. Pedersen got wan du pêşnyar pêşkêş kirine ji bo pêşketina karê komîteyê û herdu pêşnyar ji aliyê rejîma Sûriyê ve hatine red kirin û got ewê di demeke nêzîk de sardana Şamê bike û ligel berpîrsên Sûriyê ve mijarê gengeşe bike, herwiha dê sardana aliyên gerantîkar yên Asatna bike. Ji aliyê xwe, Serokê Şanda Opozîsyonê di Komîteya Destûrê Sûriyê de Hadî El-Behra di kongirekî rojnamevanî de ragehand dirêjbûna dema karê Komîteya Destûrê Sûriyê êş û azarên xelkê Sûriyê zêde û dirêjtir dike, û berdewamiya karê komîteyê bi vî rengî sivkatî ye bi xelkê Sûriyê. ElBehra dazanîn ku wan pêşnyarên xwe pêşkêş kirin û ji aliyê şanda rejîmê ve hatin red kirin. Hadî El-Behra dibêje divê ew endamên Encûmena Ewlekariyê agahdar bikin ku ev sal û sê meh bi ser karê komîteyê re derbas

dibe û tenê pênc ger hatine encamdan, û ew ger bê encam bûne û pîransîpên sereke nehate behskirin, herwiha pîrsa nivîsandina destûrêkî nû jî neketiye rojevê de. Serokê şanda opozîsyonê daxwaz ji Neteweyên Yekgirtî û şanderê wê kir bilez bendên taybet bi destûr dibiryara navdewletî

2254 cîbicî bikin ku demekê ji bo nivîsandina destûrêkî nû destnîşan bikin. Hadî ElBehra dibêje niha divê Neteweyên yekgirtî ve pîrsê çareser bike, û nabe ev pîrs were piştguhkirin. Nûnerê Kurd di Komîteya Destûrê Sûriyê, û Serokê Komîteya Pêwendiyên Derve

ya Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS Kamîran Haco ji medyayê re ragehand, bêencamiya gera pêncem ya civînên Komîteya Destûrê Sûriyê pêşbînî kirîbû, û dazanîn rejîma Esed xwe ji mijarên cidî yên di nava destûrê Sûriyê de dide aliyekî, û şanda rejîmê got ku ew ji danûstandinên

li ser asta pîransîp û nivîsandina destûrêkî re ne amade ne. Haco got rejîma dizane heger karê komîteya destûr bikeve qonaxeke din tê wateya nemana wê li ser desthilatê lewma ew astengiyan derdixe. Nûnerê Kurd dibêje mixabin ev ger hin hêvî li ser hatibûn ava kirin, lê bê encam çû serî. Derbarê mafê gelê

Kurd di destûrê bê de, Kamîran Haco got têtikiliyên wan di vî derbarê de ligel welatên zülhêz berdewam in û ewê hemû hewlên xwe dikin ji bo çespendina mafê gelê Kurd di destûrê bê yê Sûriyê de. Haco got bê magê gelê Kurd ew ne beşek in ji vî destûrî û dê xwe jê vekşînin, lê dazanîn ew ne di wê baweriyê de ne ku mafê gelê Kurd di destûr de were xwarin. Welatiyek derbarê civînên Komîteya Destûrê Sûriyê dibêje, heta niha bi hezaran ger û civîn û konferans li ser Sûriyê hatine kirin û bi nerîna min ev hemû jî demê zêdetir didin rejîma Esed û temenê wî dirêj dikin, lewma ez bawer nakin ti encamên baş ji van civînan derkevin, divê hêzeke navdewletî derbasî Sûriyê bibe û vî desthilatê biguherînin e ji ber ku ew nakeve heta ku Rûsiya û Îranê li pişt vî rejîmê bin. Rûsiya bi hemû hêza xwe li pişt rejîma Esed e û Tikriyê jî bi hemû hêza xwe li pişt opozîsyonê ye û dixwaze desthilatê bixwe destê opozîsyonê de. Bi Nerîna min heta niha niyeteke cidî ji bo çareserkirina pîrsa Sûriyê nîne. Khalid Ibrahim ji wiha li ser vî mijarê dibêje, heger hat û rejîma Esed bi cidî tevî danûstandinên Cinêvê bibe ev yek tê wateya nemana wê ji ser desthilatê û rejîm bi xwe vî yekê dizane, herwiha Rûsiya jî nahêle ev danûstandin biçin serî ji berk u sûtê ji vî welatî dibîne, herwiha Tirkiyê bi cidî di vî derbarê de tevnagere ji berk u sûtê ji rewşa xeraba Sûriyê werdigere.



Hêj DAIŞ li Sûriyê metirsî û gef e Çarenivîsa kampa Holê çî ye

Kurdistan-
Îmad Ehmed

Li çolistan di navbera Parêzgehên Dêrazorê û Humsê de, herwiha li Dêrazorê li deverên di jêr desthilata Hêzên Sûriya Demokrat de êrişên rêxistina DAIŞê gelekî zêde bûne, û rojane bi dehan çekdarên rejîma Esed û yê HSD ji encama wan êrişan tene kuştin. Herwiha berdewam li Çolistan di navbera Hums û Dêrazorê firokeyên Rûsiya baregehên DAIŞê bombebaran dikin, û DAIŞ li wê deverê bi şeweyekî cuda ji demên berê şer dike, û hejmara çekdarên wê rêxistinê jî zêde bûne, û roj bi roj xaka di jêr destê xwe berfireh dike, herwiha li kampa Holê jî rojane xelk bi destê çekdaran tene kuştin û tik es jî nizane bê kî ye. Gelo pirs ew e çima DAIŞ careke din bihêz dibe, û hejmara çekdarên wan zêde dibin. Cemil Omer wiha li ser vê mijarê dibêje DAIŞê li biyabana di navbera Hums û Dêrazorê, herwiha li gundewarê hemayê gelekî zêde bûye û êrişên wê

rêxistinê jî li ser çekdarên rejîma Sûriyê û milîsên ser bi wê ve zêde bûne. Herwiha li Deverên di jêr desthilata HSD de jî ew êriş zêde bûne, û rojane êriş li karwan û endamên HSD tê kirin, lê karekî bi cidî ji bo wê yekê jî

nayê kirin. Ez dikarim bêjim şerê rasteqîne yê rêxistina DAIŞê nayê kirin, divê ev rêxistin ji kokê bê rakirin. Mihemed Hadî jî wiha dibêje, ev çend raport tene belav kirin ku rojane xelk li kampa Holê tene kuştin

û ti kes nizane ku ev kes kî ne, herwiha rojane tê bihêstin malbatên çekdarên DAIŞê ji nava kampê direvin, gelo ev kes kî alîkariyê wan dike û kî dihêle ev kes jî kampê birevin. Ev yek tawaneke mezin û metirsiyê

li ser deverê çê dike û divê karekî cidî ji bo rêgirtina reva van kesan were kirin heta ku ti metirsî nemîne. Kampa Holê mezintirîn metirsî ye lis er jiyana xelkê û divê rêveberiya PYD vê pirsgerêkê çareser bike.



Sîleyekê wextî ez kiribama kujer



Idris Hiso

Yekem sal bû, ez ji gund hatibûm bajêr, ji bo xwendinê ez hatim bajarê Hisiça (Hesekê), dibistana gundê me bi tenê heta pola şeşê bû, pêwîstbû ji bo berdewamiya xwendinê mirov biçe bajêr, ji ber maleke me li Hesekê hebû, ji bo xwendina pola heftê amadeyî ez çûm Hesekê. Mala me li taxa Salihîyê bû,

heta niha jî mala me li wir e, dibistana me jî ne zor ji malê dûr bû, lê ji bo min gelekî dûr xuyadikir, çinku her tişt ji min xerîb bû, taxa salihîyê tenê bi qasî bi dehan gundê me bû. Ez ji hêminiya gundê xwe qut bûm, li bajêr ez gelekî mest bûm, ji kolan û xaniyên du qat û ji zarokên zikakên taxa salihîyê bi saw û tirs bûm.

Bi her halî çend roj derbasbûn min rêya dibistana Hamid Mehîfûz jiberkir, êdî ez diçûm dibistanê û dihatim malê, bi tenê min ev tişt dikir û wexta min a mayî hemû ji bo xwendinê bû, min zû xwendina waneyên xwe bidawî dikir, piştê jî min dest bi xwendina pirtûkên din dikir.

Ji ber ku min dema xwe hemû bi xwendinê derbas

dikir, roj bi roja ez di pola xwe de li cem mamosteyan hatim naskirin.

Roj bi roj ez di dibistanê de jî dihatim naskirin, gelek xwendekar dihatim cem min da ku ez alîkariya wan bikim û spartekên wan bibersivînim.

Li dibistanê, mirovekî xwîntal, çav beloq, rûreş û por incik hebû, Erebbû, herdem cilên leşgerî li ber bûn, her kes jî wî ditirsiya, mamoste jî jî wî ditirsiyan. Hemîşe devançeyek (Şeşderb) di ber qayîşa wî de bû, ew kesê qut û girover mamosteyê perwerdeya leşkerî bû.

Navê wî Mihemed Seîd Wegaa bû, Mihemed Seîd Wegaa rojekê hat pola me, em nih jî bêhnvedanê vegereyabûn pola xwe, ez jî li pêşiya xwendekarên

polê rawestiyabûm, hîn mamoste nehatibû, ez jî neçûbûm li ser kursiya xwe rûneniştibûm, min tiştê nekirbû, bitenê ez hîna neçûbûm cihê xwe.

Ji şêkêve, ji piştê sîleyek li rûyê min da ez pengizim, li bin guhê sopê ketim, birûsikê jî çavên min veda, deng ji min derneket, lê hêsiyan xwe di çavên min de negirt. Deng nema ji polê hat, gotinên me di gewriya me de xenqîn.

Ji wê rojê heta niha ku temenê min bûye 38 sal, min dixwest ez Mihemed Seîd Wegaa bikujim, gelek caran min ji xwe re digot ez mezin bibim ez dê devançeyekê bidestbixim û wî di qorzikekê de bikujim, da ku şewata dilê min vemre. Ez mezin bûm, min sîleya wî jî bîrnekir, lê min naskir

jî ku kêşe ji min wî mezitir e, ne bi kuştina wî çareser dibe, lê bi guhertina hişmendîya ku li min û wî dinerî inxer çareser bibe. Sîleya ku li min da, rêjîmê jî li miletê min dida, û serê wî jî di bin pêlawa rêjîmê de bû û ew wek koleyekî bikartanî. Namaya ku ez dixwazim ji vê gotarê bighînim ew e ku, sîleyek li min hat dan, ez zarok bûm hişt ku ez gelek caran biramim ku bibim kujer û heyfa xwe ji wî terorîstî bistînim, vêja çawa ew kesên ku di jêrmînên istixbaratên Sûriyê de rastî hemû cûreyên canezabî û îşkenciye hatine, heger derfet bo wan bê wê çî bikin. Her ez vê bûyerê di bîra xwe de tînim, ez jî kuştin û talaniya ku li Sûriyê dibe û wê hîn bibe matmayî namînim.

Huner û behremendiya Kerîm Şêxo

Mahir Hesên- Elmaniya

Folklor, kevneşopiye, huner e , girêdaye bi pênasakirin . Li her devera mirov netewa xwe bi nîşanekê dite naskirin , da ku ew ji gelên din were veqetandin, û nasnameya xweya xweser pê re çêbibe.

folklor fireh e û ji her tiştê pêk tê ku ji bav û kalan , nifş bi nifş , şaristaniya wa girtine, heya îro. Heger em kurdjî xwedî hêmanên xwe ne û folklorê me pir dewlemend û zengîn e.

Folklor dîrokî ye, ku ew nasnameya dide mirov , û her weha çavkaniyek hesta civakên nûjen e, û him buye wekî rênçber di zîndî kirina netewan de , ku bingeha damezrandina şaristaniyan di pêşerojan de dikare ava bike . Ev yekî jî sedema ku netew hewildana dikin ku çand û folklorê xwe bi rengî bedew bigihînin nifşên pêşerojê.

Bi avakirina dewletan re , erkê herî biqîmet û giring ew e , berpirsiyariya parastina çand , folklor , û mûzîk dikeve stûyê wê . Pêdivî ye ku lêgerîna dewletê nehêle ku folklor winda bibe , û bi hemdem re têkildar dikin, tê wê wateyê ku divê dewlet ji bo geşedana folklorê xwe gelek gava bavêj e , wek lêkolîn û zanistî ji bo domandin û şopandina çand û folklorê. Her çend di vî warî de kurd lewazin , û ya herî zehmet kiriye , nedewlet bûne heya ku bi awayên fermî li dibistanan û ji zaroktiyê ve zarokên xwe bi wê bidin nas kirin. Ji bilî wê yekê, hewildanên dagîrkeran bo têkbirina folklorê me , û her ji dêûbavan tête xwestin ji bo berpirsiyariyê dîr nekevin û meyla mejiyê zarokan ji prensîbên çandên biyanî û dagirin biparêzin. Hunermendên me jî bo parastina folklorê xwe xebitîne û pêkhatiyên xweyên bedew û binavûdeng li dijî ramanên hilweşîner bikar anîne, ku di dawiyê de sedema windakirina nasnameyên gelê me têkbirin . Ev perwerdehî û baweriya gelek



hunermendên me bû, mîna bandora KERÎM ŞÊXO, ku hewcedariya miletê xwe bi dengê xwe parast û hewlên pêwîst dan ku folklor biparêze.

Emê destpêkê li ser jîngiriya Kerîm Şêxo axivin û paşî nerîna wî derbarê muzîka kurdî de bidin xuya kirin.

Jîngiriya Kerîm Şêxo Kerîm Şêxo di sala 1980-an de ji dayik buye, ji ciwaniya xwe ve ber bi stranbêjiyê ve çû . Sedema rewşa jiyana xirab li herêmên Kurdî ji encama pîvanên siyaseta birçibûnê , tenê xwe sparte kar , heye ku dabînkirina lêcûnên albûmên xwe hilbigire û berhev bike . Di demê kurt de, bi navûdeng bû ji Robarê Dîjlê heya Çiyayê kurmenc li Efrînê û deverên din yê kurdistanê belav bû. Albûma wî ya yekem li ser dayikê ye. kerîm wekî hevaleyê malbata hunermendê mezin Mihemed Şêxo tête nasîn .Vê tîkiliyê çanda wî ya hunerî û muzîkî bandor kir . Dibe ku ev ezmûna hûrgulî di behremendiya Karim de hate veguheztin ku ew bibe nav karê hunerî. Tevî kerîm di rêwîtiyek feqîriyê de dijiya, lê ji huner û stranbêjiyê hez dikir, ku bi awaza xwe di nav jiyaneke dewlemend û bala de xwe didît . Performansa wî ya hunerî qet nesekinî, û pêşkeşkirina stranên bêhempa yên ku bi demên xweşî û nexweşiyê re derbas bûn û gelek alîgir û guhdarvanan bi dest xist.

Kerîm her gav xwe bi dengê xwe yê zîz û hezkirina xwe ya ji bo gotina bihêz û bi dilpakî diyar kiriyê

di heman demê de kerîm xwedî karîzmayek diyar e , kesayetiyeke bihêz û bibandore , û bi motîvasiyonek ku biryar û biryardariya xwe pêk bîne da ku bigihîje armancên xwe.

Karîm azarên welatê xwe hilgirt û bi gelek helwest û stranên berevaniya doza kurdî kir û bû sedemek ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hate girtin û şopandin û bû sedema koçberiya wî ber bo Ewropa ve di sala 2010an. Behremên albûmên Kerîm

- 1- her buhar 2003
- 2- cenga jînê 2005
- 3- mam bi tenê 2007
- 4- şop û evîn 2016

Kerîm di qonaxek pir dijwar de xuya bû, dema ku strana Kurdî ber bi lawaz bûnê ve diçû , tu dikarî ji me û ji xwendevana re wê yekê zelal bike ?!

Kerîm: Hunermendî ne tenê hestiyariye ,dive ku pir zîrek be û zanibe bi çi rengî stranên xwe pêşkêşî bike. belê Rejîmên dagîrkerên ên Kurdistanê her dem ji bo berevajîkirina folklorê Kurdan hewl didin û dixebitin ku bandorek neyînî li çanda me bikin. wekî nimûneyek herî mezin , hîlbijartina navên albûmên gelek hunermendên kurdistanê Sûrî bi navên Erebi an jî derketina wan di konserên netewî de ne bi cilûbergên Kurdî bûn.

Îcar herger ev zanabûnek ji dagîrkera ye yan jî ji nezaniya kurda ye. Ger zanaya dijm be, bandorek kir , herger ji nezaniyê be, nezaniyê ji dagîrkerî xirabtir e.

Çand serwertiya miletan dike û kulturê me zengîne , heya çi astê hunermend dikare kulturê xwe pêş bixe ?!

Kerîm: tiştêk li vir heye û ez dixwaz im ji xwendevana re bêjim , gelek dibêjin di kultur û çanda me de sixêf û xeberên çewt hene. Na kultura me paqije , ew stran û lawik û heyranokek wisa ji devê kesên li nanê xwe yê rojana digeriyan derketine, hunerî bi rengekî tê bi kar anîn. Bi awayekî din , naba ez stranek mihemed arîf cizrawî di şevbuhêrkekê de gotiye û tede navê kesên derdora xwe bilêv dike ez jî herim navê wî filan kesî bêjim. Dive em zanibin kultur û folklor çiye ewqas. Em li ser helbesta kurdî bi axivin gelo em dikarin bêjin helbesta kurdî di geşedaneke de ye ?

Kerîm: helbesta kurdî tenê bi rêça strana geş dibe , û helbestvan tê nas kirin. Mixabin em wekî miletan guh nadin xwendina behremên helbestvana , sedem jî ev e , nezandina ziman e.

Ji me re li ser serpêhatiya xwe ya li tora Civakî û encamên wê yên posetîv bike, nemaze di dema pandemiya Corona de

Kerîm: Pandemiya Corona tevahî cihanê dorpêç kir , ji wê yekê hukûmeta hin biryarên dijwar dan mîna ku li mal bîmînin , lê dîsa tiştên negatîf tiştên erênî jî bi xwe re tîne, mînakî saetek deaktîv ku rojê du caran durst dibe , ev jî hişt belev bûna Corona lewaz bibe û kême be . Ez gelek hewl didim ku nêzikê miletê xwe bim. Ez ji wê yekê dilşad im , û ev peywira min e û erkê me ye wekî hunermenda nêzikî miletê xwe bin da ku li mal bêzar nebin. ji bo parastina hunera Kurdî tu çi pêşniyar dikî ?!

Kerîm: Divê her hunermend stranên xwe belge bike, her weha rewşenbîr piştgiriya wan bikin, û divê em rola medyayê jibîr nekin û em bi yek destî bixebitin da ku karibin diparastina çanda xwe berdeham bikin.

Li ser adet û kevneşopiyên di civata Kurdan de ji te re bûn astenk ?!

Kerîm: na , berevajî wê yekê, malbata min piştgirî da min ji ber ku wan dizanibû ku ez ji bo gelê xwe, û nasnameya xwe stranên dibêjim

Hunermend Kerîm Şêxo ji beylî stranabêjiyê di çi de jî behremên xwe di kara bide diyar?!

Kerîm: Hewesa min ji listikvaniyê re jî heye, û ez bi Koma Narîn re sala 2002 beşdarî şanoyê bûm û demê min stranek li ser şehîd silêman adî jî got

Karên nû yên din hene ku Kerîm pêşkêş bike?!

Kerîm: Belê, lê ez nikarim demê diyar bikim û ev bi rewşek darayî re têkildar e

Belê, ezê gotara xwe bi dawî bikim û xwestika min bû ku ji kaniya behrêmên Kerîm darek di nav bax û bexçê welatê xwe de av bidim, û li ser cûdahî û nûjenî û hîlbijartina rengê strana ku kerîm ji bo xwe dixwaze axivim , û li ser destpêkirina gavên wî yên bilez ber nûvekirinê ve bişobînim , û riya hunerî ya ku wî di salên borî de bi hemî lebat, xweşî û bîhnxeşiya xwe ve beşek jê berheve bikim Çendî em li ser huner û folklorê xwe bi axivin gelek kêmasî hebin. Ya herî giring ew e gotina BABLO BÎKASO bîra xwe bînin((Her zarok hunermendek e, pîrsgirêk ew e çawa ku mezin bibe û hûnermend bimîne.)) Gotinên wisa lihevhatî gelekî bo me kurda pîroz in heya nifşekî netewperwer û xakhez li çand û folklor û kulturê xwe xwedî derbikeve û bi hemî aliyên dinyayê bide nasîn û xwendin